Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 387 nameronahi@gmail.com 01 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Minbic..Polîtîkeyên Osmaniyan û Rêjîma Baas – 2

## Rêjîma Sûriyê rêya mazotê girtiye



**Idrîs HENAN**

Li Kantona Şehbayê bi qasî 500 Hezar mirov dijîn. Tevî kêmderfetiyan gelên li vê herêmê li hemberî dagirkeriya Tirk û kiryarên rejîmê bi îmkanên xweser li ber xwe didin. Rejîma Sûriyê ji destpêkê ve di nav hewldanên provakasyon û çewsandinê de ye. Gelek caran hewl da ciwanan neçarî leşkertiya bi zorê bike. Nahêle nexweş tedawî bibin û rê li ber veguhestina wan digire. Di aliyê jiyanî de rê li ber pêdiviyên gel digire. Demeke jî rê li ber hatine sûtemeniyê û bi taybet madeya Mazotê girtiye. Li gorî meclîs û komînên ku pêdiviyên gel dabîn dikin; ev nêzîkatiya rejîmê dê bi xwe re gelek astengiyên cidî bîne. Nebûna madeya Mazotê bandor li peydakirina av û ceyranê jî kiriye. Bîrên avê û cenertor di bin gefa sekinandinê de ne. Noqteyên belavkirina avê li Şehbayê tekez kirin wê ji ber nebûna madeya Mazotê di van çend rojên bê de bisekinin. Karmendên sûtêr û erebeyên veguhestina avê diyar kirin ku rejîm bi helwesta xwe dixwaze rêveberiya me vala derxîne û ji bo hinek berjewendiyên siyasî gel li vê herêmê bikar bîne. Şêniyên Şehbayê jî piştrastkirin ku wê ev nêzîkatiya dermirovî ya rejîma Sûriyê bandorê li çandiniya Şehba jî bike. Taybet ku niha dema çinîna dexil û teneyan e. Wê patoz bisekinin, genim û dexla heyî jî xira bibe.

Ji aliyekî din ve rêveberên kampên li Şehbayê destnîşan kirin ku ev kiryara rejîma Sûriyê bandoreke xirap li jiyana şêniyên li kampan dijîn dike. Rejîm dixwaze bi riya zextên aborî, siyasî gelê me neçarî radestbûyînê bike. Hêjayî gotinê ye ku ji destpêka hatina gelê Efrînê ya Şehbayê rejîma Sûriyê ji bo ku hevgirtina gelên li Şehbayê birûxîne û baweriya gel bi rêveberiya xwe têk bibe, di nava provakasyonan de ye. Yek ji rengên zextên rejîmê jî qutkirina pêdiviyên jiyanê yên sereke ku madeya Mazotê yek jê ye. Zêdeyî deh rojan e rejîma Sûriyê rê li ber hatina vê madeyê girtiye û nahêle ku derbasî Şehbayê bibe. Ev jî dibe sersebebê gelek pirsgirêk û ziyanên jiyanî û aboriya herêmê xira dike. Gelên li Şehbayê di vê derbarê de nerazîbûn nîşan dan û bang li rejîmê kirin ku dest ji van kiryarên dermirovî berde.

## Med Spor jî çîrokek penaberiyê ye



Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî tîma futbolê ya bi navê Med Spor ya di nava şertên giran yên penaberiyê bi komeke ciwan destpê kirî, ji nû ve bi heman ruhî di bin banê Tevgera Ciwanên Mexmûrê de zindî dibe. Di nava jiyana koçberiyê ya gelê ku ji war û cihên xwe koç kirî, sporê jî cihekî xwe yê taybet girt û bûye xwedî dîrokeke tije ji êş û serkeftinên mezin. Tevî nebûna cil, pêlav û gokê jî, lê bi disiplîn û ruhê hevaltiyeke saxlem dîrokeke ya werzîşê li pey xwe hiştiye. Tîma Futbolê ya Med Spor jî tinebûnê hebûneke da afirandin.

Mamosta Sedîq Benek bal kişand ser xebatên sporê yên di nava jiyana koçberiyê de û got: "Weke her zarokekê eleqeyekî mezin ya min ya ji bo sporê bi taybet lîstina futbolê hebû. Dema em penaber bûn û me dibistan dixwend li gel çend hevalên xwe me sala 1999'an tîmeke ya futbolê kuji 12 kesan pêk tê ava kir. Piştî demeke dirêj, ciwanan berê xwe da sporê û tîma me avakirî êdî gihişte 24 kesan. Piştî serkeftinên mezin, tîma me bû fermî. Me navê tîma xwe jî kire yek ji navê pêşengên Kurdan Med Spor."...*ROJNEWS*







Herêma Minbic xwedê cihekî dîrokî û stratejîk e. Minbic dikeve rex çemê Firatê, her wiha nêzî sînorê Sûriyê-Tirkiyê û bajarê Helebê ye. Li aliyekî din jî nûqteya ku herêmên gundewarê rojhilat û bakurê Helebê dighîne hev. Li ser vê yekê wekî navenda tevgera çandî û civakî tê dîtin. Dewleta Osmaniyan û rêjîma Baas di dema ku hukmê xwe li ser herêmê feriz kiribûn, hewl dan demografiya herêmê biguherin.

Teymûrlenk sala 1401'î de êrîşî bakurê Sûriyê kir û bajarê Minbic dagirkir û wekî baregeha ji bo pêkanîna hemleyên xwe yên li ser Sûriyê nîşan kir, leşkerên wî bajar wêran kirin û kevir li ser kevirekî nehiştin. Minbic veguherî erdekî vala, kavilkirî. Salên di navbera 500 heta 1900 de jiyan lê rawestiya.

Akademîsyenê Zanîngeha Oxfordê Henrî Mandrel ku rênasê şirketa Elmeşriq bû, di sala 1697`an serdana herêma Mibicê kiribû, di derbarê rewşa bajêr de wiha dibêj, "Li vî warê ti tiştekî mezin nemaye". Minbic bi temamî rûxiya bû. Li aliyê wê yên rojhilat beşek sûra wê saxlem ma.

### 350 MALBATÊN ÇERKEZ HATIN BI CIHKIRIN

Bi armanca guhertina demografiya herêma Minbicê, Sultanê Osmanî Ebdulhemîd yê duyemîn sala 1878'an de 350 malbatên Çerkes li Minbicê bi cih kir. Di heman demê de jî dewleta Osmanî hemleya qirkirinê li dijî Ermenan pêk anî ku heta 1923'an dewam kir.

Her wiha Dewleta Osmanî bi armanca ku rengê Osmanî bide bajarê Minbicê di sala 1904'an de li bazara bajêr serşokên giştî ava kir û li ser serşokan "Sultan bixêrhatina we dike" hate nivîsandin. Dewleta Osmanî piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn 1914 – 1918 bi Hêzên Hevpeyaniyê re (Împaratoriya Alman, Austria, Macaristan û Bulgaria) ya li hember Birîtanya, Irlanda, Fransa û Rûsya koalîsyon pêk anî. Osmaniyan seferberî ragihand, kesên ku bikaribin çek rakirin bi çek kirin û ew ber bi herêmên şerê ve, di nav de Minbic jî hebû, ve şandin.

Ji encamên sereke yên Şerê Cîhanê, hilweşandina Împaratoriya Osmaniyan, dabeşkirina welatên Ereban li gorî Peyama Sykes-Picot. Sûriye, Lubnan û Mûsil ket bin serweriya Fransa û Urdun û Filistîn jî ket bin serweriya Îngîlizan. Li vir jî rewşa Minbic wekî xwe ma.

Piştî derketina Fransa ji Sûriyê sala 1946'an êdî welatiyên Minbic di nava partiyên siyasî de xwe bi rêxistin kirin, her wiha dibistan li Minbic û gundewarên wê hatin avakirin. Yekemîn Navenda çandê li Minbicê bi nave Navenda Çanda Erebî ya Minbicê hate vekirin.

### POLÎTÎKAYÊN RÊJÎMA BAAS

Rêjîma Baas polîtîkeyên derxistina tevliheviyê di navbera pêkhateyên de û guhertina demografî, meşand. Desthilatdariya Partiya Baas di sala 1974'an de bi hênceta ku gundên başûrê Minbicê di ava gola Bendava Firatê de ma bi hezaran malbat koçî gundên herêma Cizîrê kirin û li 43 niştecîgeh bi navê "El-Xemer" ku dirêjahiya xeta di navbera Serêkaniyê û Dêrikê ava kiribû, bi cih kirin. Rêjîma Baas di sala 1982'an de, bi hênceta ku gelê Minbicê beşdarî tevgera li dijî Partiya Baas bûye, hejmarek gundên girêdayî wê bi tankan dorpêç kir û xof di nava şêniyên wê de çêkir. Di sala 1999'an de bi sedan şêniyên gundên li Çemê Firatê yên girêdayî Minbicê bi hênceta ku gundên wan di bin ava Bendava Tişrîn de man koçî gundewarên Meskene kirin.

Li bajarê Minbicê di serdema desthilatdariya Partiya Baas de tu pêşketin pêk nehat Berevajî wê, rêjîmê mozayîka herêmê ya eşîrtî parçe kir.

Bi destpêka pêvajoya Şoreşa Sûriyê re, gelê Minbicê li hember rêjîmê Baas daketin qadan, xwepêşandana yekemîn li bajêr 21'ê Nîsana 2011'an de destpê kir. Hin komên çekdar 19'ê Tîrmeha 2012'an de bajar girtin, ew koman bajar wêran û talankirin. Heta Çileya 2014'an di nava pevçûnan de bûn û bajar veguherandibûn bajarekî tarî...

*Ekrem Berekat-ANHA*

## Modela Rojava demokratîk e




Heyeta ji Elmanyayê ku parlamenter, akademîsyen û rojnamevan jî di nav de ne, li Rojava hevdîtinan dewam dike. Endamê heyetê derhêner û fîlmçêker Peter Ott got, "Li Rojava xwerêveberiya li ser bingeha nirxên demokratîk û wekheviya jin-mêr gelekî bedew û bi bandor e. Kêmasî timî tên çareserkirin, yanî modeleke ku timî xwe nû dike."*R-5*

## AKP ji jinan û ji HDP'ê ditirse



Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan tevlî merasîma vekirina Buroya Hilbijartinê ya Jinan a li navçeyeke bajarê Tirkiyê Stenbolê bû. Bûldan li vir axivî û wiha got, "Jin wê mohra xwe li hilbijartinên 24'ê Hezîranê bixin. Ji ber ku HDP partiyeke jinan e AKP ji jinan, ji HDP'ê ditirse."*R-4*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 387 01 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

**Bazar û Bazirganî**



*Mihemed SEYDÎ* *R-5*

# MALÊN SIVÎLAN KIRINE ÊŞKENCEXANE



### LI EFRÎNÊ ZILM HER ROJ ZÊDE DIBE

Zilm û zordariya artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê her roj zêde dibe. Dagirker bi her awayî zilmê li gel dikin û dest danîne li ser malên welatiyan. Malên welatiyan yên ku dest danîne ser weke êşkencexane bikartînin.


### BI DEREWAN SIVÎLAN SÛCDAR DIKIN

Leşkerên Tirk yên dagirker û çete li Efrînê bi tawanbarî û hêncetên derew bi her awayî kirinên dermirovî li welatiyan dikin. Welatiyan direvînin, dest datînin li ser malên wan û malan weke cihê êşkencekirina sivîlan bikartînin.

### BI HEZARAN DOLAR DIXWAZIN

Leşkerên artêşa Tirk a dagirker ji gundê Çeqmaqê girêdayî navçeya Raco 8 sivîl revandin û birin girtîgehên ku li Cindirêsê vekirine. Hat ragihandin ku çete welatiyan direvînin û li miqabilî wê jî 7 hezar dolar ji malbatên wan dixwazin. *R-2*

## Hevdîtina bi Ocalan re cara 760'î hate astengkirin



Dewleta Tirk ya dagirker tecrîdeke giran daniye li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û pêwendiya wî bi derve re qut kiriye. Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo hevdîtinê bi wî re bikin cara 760'î ye ku serî li Serdozgeriya Tirk dan lê ev daxwaza wan jî bi heman hincetên berê hat red kir. *R-2*

## Jin pirsgirêkên xwe çareser dikin




Xebatên rêxistinbûnê yên jinan li Rojava û Bakurê Sûriyê berdewam dike. Jin bi xwe pirsgirêkên xwe çareser dikin. Komîteya Lihevanînê ya Mala Jin ya herêma Cezrat a Rojhilatê Dêrazorê buye hêviya jinan û heta niha 250 doz û pirsgirêkên jinan çareser kiriye. Jinên herêmê ji komîteyê razî ne.*R-3*

## Gêrîla wê Pêngava 1'ê Hezîranê bike meşa azadiyê



Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG'ê bi wesîleya salvegera Pêngava 1'ê Hezîranê peyamek weşand û diyar ku, di sala 15'an a Pêngava 1'ê Hezîranê de, Gerîlayên Azadiya Kurdistanê yên xwedî tecrûbeya 35 salan wê bi ruhê fedayî yê Apocî bi erk û wezîfeya xwe rabin.

Fermandariya NPG'ê wiha wiha got, "Felsefeya Rêber Apo, xeta şehîdên me yên leheng wê her tim ji bo hêzên me yên gerîla bibin çavkaniya bingehîn a hêzê û bi vê hêzê wê serketin misoger bibe. Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ku wê ji aliyê taktîk û teknîkê ve bi rengekî profesyonel tevbigerin, wê têkoşîna sala 15'an a Pêngava 1'ê Hezîranê bikin meşa Rêberê Azad û Kurdistana Azad." *R-4*

## Rêjîma Îranê kolberek din kuşt

Zext û zordariya rêjîma Îranê jî li ser gelê Kurd yê li Rojhilatê Kurdistanê bê navber berdewam dike. Şeva 31'ê Gulanê pasdarên rejîma Îranê li navçeya Pênciwên gule li kolberan reşandin û di encamê de kolberek ê ji Rojhilatê Kurdistanê hate kuştin. *R-2*



## Li hember êrîşan divê em yekîtiyê ava bikin




Sekretêrê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno bal kişand li ser êrîşên dagirkeran yên li dijî gelê Kurd û banga yekîtiyê li Kurdan kir. Keno wiha got, "Divê hemû aliyên Kurd nakokiyên xwe deynin aliyekî, Kongreya Netewî ya Kurdistanê li dar bixin û bi yekîtiyê bersiva dagirkeran bidin." *R-5*

## Hemû Kurd li dora HDP'ê dicivin





Hevseroka Civaka Demokratîk KCD'ê û namzeta parlamenteriyê ya Colemêrgê Leyla Guven ku dîl girtî ye, diyar kir ku Kurdên ku berê dengên xwe didan AKP'ê wê êdî nedin û wiha got, "Ji rojava heta rojhilatê Tirkiyê, ji başûr heta bakur civak wê destekê bide HDP'ê. Wê Meclîsê bêyî HDP'ê nehêle." *R-4*

## Li Ewropayê mal bi mal digerin



Koordînasyona HDP'ê ya Hilbijartinê ku 22'ê Nîsanê ava bû, li 26 welatên Ewropayê û ji Japonyayê heta Kanadayê ji bo hilbijartinê karekî berfireh dike. Endamê koordînasyona hilbijartinê Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) Yuksel Koç got, "Armanca me ew e ku ji 7'ê Hezîranê gelekî zêdetir dengan bigirin." *R-4*

## Divê ciwanên Rojhilat beşdarî gerîla bibin



Endamê Desteya Rêveber a KODAR'ê Mazlûm Heftan diyar kir ku yek ji mijarên ku komploya li ser Ocalan têkbir, beşdarbûna keç û xortên Rojhilatê Kurdistanê ya nav refên gerîla bû. Heftan wiha got, "Rêber Ocalan ji bo gelê Kurd û gelên azadîxwaz, fikir û felsefeya jiyana nû afirandiye. Ez bang li ciwanên Rojhilatê Kurdistanê dikim bila tevlî nava refên gerîla bibin." *R-5*

## 11 leşkerên Tirk hatin kuştin



Çalakiyên gêrîlayên HPG'ê yên li dijî artêşa dagirker ya Tirk li başûr û bakurê Kurdistanê bê navber bi awayekî bi bandor berdewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li Barzan, Lêlkan û Şemzînanê 11 leşkerên Tirk hatine kuştin. *R-2*

# Li Efrînê zilm û zordarî zêde dibe

***Zilm û zordariya artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê her roj zêde dibe. Dagirker bi her awayî zilmê li gel dikin û dest danîne li ser malên welatiyan. Malên welatiyan yên ku dest danîne ser weke êşkencexane bikartînin.***

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê malên sivîlan dikin bargehên lêpirsîn êşkencekirinê.
Hate diyarkirin li herêma Racoyê 8 sivîlên din ji aliyê dagirkeran ve hatin revandin û li beramberî berdana wan pereyan ji malbatên wan dixwazin.
Kiryarên hovane yên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî sivîlên Efrînê didomin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê şêniyên Efrînê bi tawanên derew direvînin û malên wan vediguherînin navendên lêpirsîn û êşkencekirinê.
Çavkaniyek ji bajarê Efrînê diyar kir ku çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker ji gundê Çeqmaq ê ser bi herêma Racoyê 8 sivîl revandin û ber bi gundê Çiqla yê herêma Cindirêsê ve ku girtîgeh li wir vekirine birin. Heman çavkaniyê destnîşan kir ku çete li beramberî berdana sivîlan 7 hezar dolar ji malbatên wan dixwazin.
Çavkaniyek din ji gundê Cala yê girêdayî herêma Raco da zanîn ku çeteyên girêdayî artêşa Tirk malên welatiyên gundê Cala dikin navendên lêpirsîn û êşkenckirinê.
Girêdayî mijarê şêniyên gundê Çala diyar kirin ku çeteyên dewleta Tirk ji gundên (Çeqmaqa, Xilalka, Cencliya û Elemdar) ên girêdayî herêma Raco 50 sivîl ku demê berê revandibûn, revandin û niha li “Bargehên lêpirsînê û êşkencekirnê” ne rastî lêpirsîn û êşkencekirinê tên...*ANHA*



## 11 leşkerên Tirk hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê diyar kir, di çalakiyên gerîla de yên 29-30’ê Gulanê herî kêm 11 leşkerên Tirk hatin kuştin.
Di daxuyaniyê de li ser çalakiyên gerîla ev agahî hatin dayin:
“Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî artêşa TC a dagirker çalakî kirin:
29’ê Gulanê saet 17:45’an, hêzên me yên YJA Starê li leşkerên dijmin ên li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Sîdekayê ya li Başûrê Kurdistanê xistin. Di vê çalakiya sûîqestê de leşkerekî dijmin hate kuştin.
30’ê Gulanê saet di navbera 12:30-17:30’î de hêzên me yên YJA Starê li dijî dagirkerên li ser girê Lêlîkanê çalakiyên sûîqestê kirin. Di çalakiyan de 2 leşkerên dijmin hatin kuştin.
Hêzên me roja 30’ê Gulanê saet 07:30’î, li dijî yekîneyeke artêşa TC a dagirker a li mintiqeya Tepê Xwedê ya li herêma Barzanê çalakiyeke sabotajê kirin. Di vê çalakiyê de çepera ku leşker lê bûn bi temamî hate rûxandin û bi qasî hate tespîtkirin 5 leşker hatin kuştin.
Yekîneyeke dijmin ku ev demeke li girê Kelebekê yê navbera gundên Kola û Dêmanê yê navçeya Şemzînanê bi cih bûye, ji aliyê hêzên ve hatin kontrolkirin. Û 30’ê Gulanê saet 19’an hêzên me li vê yekîneya dijmin xistin. Bi derbên ku ji nêz ve li yekîneya dijmin hate xistin, 3 leşker hatin kuştin.

## Di êrîşa DYA’yê de 50 endamên Talîbanê hatin kuştin



Fermandarê hêzên Amerîkayê yên li Afganîstanê û NATO’yê John Nîcholson da zanîn ku di operasyonekê de ya li ser rêveberên Talîban, ji 50’î zêdetir endamên Talîban hatine kuştin.
General Nîcholson li Pentagonê bi telekonferansê daxuyanî da nûçegihanan û got piştî ku hêzên Talîban li herêma Farah şikandin, ketine pey şopa wan.
Generalê Amerîkî diyar kir Talîban vegeriyane Helmandê ya başûr, ku keleha wan e û di bin çavdêriya leşkerên Amerîkayê de ye, 24’ê Gulanê li bajarokê Mûsa Kala, li avahiyekê ku navenda fermandariya Talîban e, hatine tespîtkirin.
Nîcholson got, ‘’Komeke ji şefên leşkerî pêk dihat, ku ji bo operasyona Farahê nîqaş bikin li hev kom bûbûn’’.
Fermandarê NATO’yê got, ‘’Ji wan weye ku li Mûsa Kalayê civîneke ewle dikin, lê serwîsên me yên îstîxbaratê kom tespît kir û bi rengekî serkeftî li wan xist.’’
General îdîa kir ku ev kom bi rengekî aktîf karê hişbirî û tiryakê dikir û got, ‘’Ez nikarim bibêjim ku ev operasyon bi girîngiyeke stratejîk e, lê bi asta xwecih teqez pir girîng e.’’
Li gorî fermandariya Amerîkayê ya Afganîstanê di operasyonê de ji du zilamên girîng ên Talîban ê ku Helmandê kontrol dikin, Abdul Manan, gelek şef û rêveberên xwecih ên Kandahar, Kunduz, Herat, Farah, Uruzgan û Helmandê bi tevahî 50 endamên Talîbanê hatin kuştin.

## Şandeya Elman serdana Minbicê kir


Serdana şandeya Elman li Bakurê Sûriyê dewam dike. Şande çû serdana bajarê Minbicê û bi endamên rêveberiya sivîl a demokratîk a bajarê Minbicê re civiya. Di civînê de nîqaş li ser êrîşên artrêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ya li ser Efrînê û gefên wan ji Minbicê re hatin kirin.
Şandeya Elman ku ji parlementer, akademîsyen û hunermendan pêk tê serdana bajarê Minbicê kir. Şande ji aliyê endamên Rêveberiya Demokratîk a Minbicê û gundê wê ve hate pêşwazîkirin. Rêveberiya Minbicê bi şandeyê re li ser dagirkeriya Tirk ya li Efrînê



û derketina welatiyên Efrînê ya ber bi Şehbayê ve nîqaş kirin. Şandeyê destnîşan kir ku ew dixwazin serdana welatiyên Efrînê yên li Şehbayê bikin.
Endamên şandeyê behsa ezmûna demokratîk a Bakurê Sûriyê û biratiya gelan, her wiha hevkariya di navbera pêkhateyan de kir..

## Hevdîtina bi Ocalan re cara 760’î hate astengkirin

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo hevdîtinê bi wî re bikin cara 760’î ye ku serî li Serdozgeriya Komarê ya bajarê Tirkiyê Bûrsayê didin. Serdozgeriyê bi heman hincetên berê ev daxwaz jî red kir.
Ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Mazlum Dînç, Îbrahîm Bîlmez û Raziye Tûrgût bi boneya bi miwekîlên xwe re hevdîtin bikin, cara 760’î serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê dan. Daxwaza parêzeran hate redkirin.
Daxwaza hevdîtinê ya parêzeran a bi Ocalan re ji 27’ê Tîrmeha 2011’an û ve ev bû cara 760’î



bi hincetên ‘Rewşa hewayê’, ‘Keştî xirabeye’ Rewşa Awarte’ tê astengkirin.

## Rêjîma Îranê kolberek din kuştin

Pasdarên rejîma Îranê li navçeya Pênciwên gule li kolberan reşandin û di encamê de kolberek ê ji Rojhilatê Kurdistanê hate kuştin.
Şeva 31’ê Gulanê li nêzî gundê Mêşero yê girêdayî bajarokê Germik yê navçeya Pênciwên a ser bi parêzgeha Silêmaniyê, ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve kolberek hate kuştin.
Der barê bûyerê de qeymeqamê navçeya Pênciwên Zana Rehman agahî dan û got; “Kolber navê wî Kamîl Muradî ye û dîroka jidayîkbûna wî sala 1992 e. Ji gundê Soraw yê Rojhilatê Kurdistanê ye û bi guleya pasdarên Îranê hate kuştin. Pasdarên Îranê ji nav gundê Mêşero gule li kolberan reşandin. Çend kîlometre ji gund dûr bûn.



Piştre hêzên polîsên Pênciwên çûne cihê bûyerê û cenazeyê kolberê hatî kuştin, şandina morga nexweşxaneya Silêmaniyê.”
Zana Rehman got; “Li ser bûyerê lêkolîn tê kirin. Piştî bicih anîna karên yasayî, wê cenazeyê kolber bê şandin Rojhilatê Kurdistanê û teslîmê malbatê bê kirin.”…
*ROJNEWS*



# Li dijî qirkirina çandê têkoşîn girînge

***Dewleta Tirk li Kurdistanê qirkirina çandî û dîrokî didomîne. Li bakurê Kurdistanê deverên dîrokî yên mîna Heskîfê ji aliyê dewleta Tirk de tê wêran kirin. Endama Komîsyona ekolojiya HDP’ê Prof.Dr. Beyza Ustun got, “Li dijî qirkirina xweza, dîrokû çandê divê bi HDP’ê re têkoşîn bê dayîn.”***

Prof Dr. Beyza Ustun diyar kir ku ekolojîst û gel xwedî li Heskîfê derneketine û divê xwerexnedayîna vê bê dayîn û wiha got: “Li dijî qirkirina xweza, dîrokû çandê divê bi HDP’ê re têkoşîn bê dayîn.”
Endama Komîsyona ekolojiya HDP’ê Prof.Dr. Beyza Ustun texrîbata li Heskîfê û hilweşîna li Sûra Amedê nirxand û diyar kir tiştên li Heskîfê pêk tên êrîş in û got: “Heskîf tune dibe û bi xwe re dîrokê jî tune dike.”
Beyzayê destnîşan kir ku Heskîf nûneriya gelan û şaristaniyan e û wiha pê de çû: “Cihekî wisa di esasê de di hemû qanûnên navneteweyî de tê parastin. Cihekî ji aliyê Peymanên NY’ê, UNESCO’yê jî tê parastinê ye. Lê mixabin sermaye qada ku dixwaze dike qada xwe.”

**EM XWEDÎ LI HESKÎFÊ DERNEKETIN**

Beyzayê dîsa balkişand ser texrîbata li Heskîfê û got Çemê Dîcle û Heskîf tune hatiye hesibandin û xistine qada sermayê. Beyzayê wiha dirêjî da axaftina xwe: “Em kesên têkoşîna ekolojiyê didin li Allîanoî nehatin cem hev, li Heskîfê nehatin cem hev. Divê em têkoşînê bimeşînin. Ger îro Heskîf di bin avê de bimîne ji ber me ye. Em bi hev re xwedî lê derneketin. Divê em ewil xwerexnedayîna xwe bidin. Divê em hemû kes xwedî li dîroka xwe derkevin.”
Beyzayê diyar kir ku mudaxaleya li hember Sûr, Cizîr û Nisêbînê jî ji Heskîfê ne cuda ye û bi konsepta şer, OHAL û qedexeyên derketina derve ew der hatine hilweşandin û tunekirin. Beyzayê daxuyakirin ku Sur, bi gel, dîrok û çanda wê bi zorê hat tunekirin…*JINNEWS*



## Dixwazin xaka Kurdistanê dagir bikin

Nivîskar Hekîm Mele Salih li ser dagirkeriya dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê got; “Dijminê gelê me hemû di nava plana dagirkeriya xaka Kurdistanê de ne. Ji bo ku em pêşî li vê dagirkeriyê bigirin, divê em di nava mala xwe de yekitiya xwe ava bikin.”
Êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser xaka Başûrê Kurdistanê berdewam dikin. Li hemberî vê li şûna helwestê, nakokî di nava aliyên siyasî yên Kurdistanê de hene. Li ser vê mijarê nivîskar Hekîm Mele Salih ku xelkê Helebce ye, diyarkir ku pîlanên dewletên dagirker ji berê de hebûn û wiha got; “Pîlanên hevbeş yên dewletên dagirker ji dîrokê ve tên,



dagirker li dijî Kurdan hemû xwe dikin yek. Niha leşkerên dewleta Tirk ketine nava xaka Başûrê Kurdistanê. Baregehên xwe di nava xaka Başûr de ava kirine. Ev jî metirsiyê li ser xelkê ser sînor û wan gundan çêdike. Divê ji vê zêdetir rê neyê dayîn.”

**DIVÊ BERJEWENDIYÊN NETEWÎ LI PÊŞ BE**

Hekîm di dewama axaftina xwe de balkişand ser sedemê dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê û wiha dewam kir; “Nakokiya di navbera aliyên siyasî de dike ku dijmin were nava xakê. Hêzên Başûrê Kurdistanê bi hizibayetiyê ve mijûlin. Berjewendiyên hizbî xistine pêşiya armanca netewî. Herwiha bêdengiya welatên bihêz jî kiriye ku leşkerên biyanî bikevin nava xaka me.”
Nivîskar Hekîm wiha dawî li axaftin axwe anî; “Divê desthilatdarên Herêmê û hemû hizbên Kurd bi yekitiya netewî ava bikin. Hewla parastina sînoran bikin. Êdî nehêlin tu welat û leşkerek sînoran derbaz bikin û welat bi parêzin.”…*ROJNEWS*

## Pirtûkên binaxkirî hatin dîtin



Pirtûkên ku ji ber tirsa rêjîma Baas hatibûn binaxkirin li Reqayê hatin dîtin. Hin ji wan pirtûkan di dema niha nayên peydakirin, lewra saziyên peywendîdar diyarkirin ku ew ê jinûve çapbikin.
Tîma Lêgerînê ya Komîteya Jinûve Avakirinê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê, di çarçoveya xebatên xwe de, 41 pirtûk ku di kavilan de hatibûn bin axkirin, dîtin û radestî Akademiya Civaka Demokratîk a Kantona Kobanê kirin.
Pirtûkên hatin dîtin bi zimanên Kurdî û Erebî bû, piraniya wan ên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bûn.
Ji pirtûkên hatin dîtin; Rêberetî û Gel, Jin û Malbat, Rojhilat piştî hilweşandina pergala mîtînger, Mijara Kesayetî li Kurdistanê, Destana Filkolra Kurdî, Berxwedan Jiyan e, Tevgera Îslamî ya Kurdistanê, Doza Civaka Niştimanî ya Kurdistanî û hwd.
Dixuyaye pirtûkên ku ya malbateke Kurd e, ji tirsa rêjîma Baas veşartibû.
Desthilatdariya rêjîma Baas, kesên her tiştên girêdayî kurdiyatiyê qedexekiribûn û gelek welatiyên Kurd ku li gel wan pirtûk didîtin dihatin girtin û êşkencekirin, gelek ji wan heta niha di girtîngehan de ne.
Endamê Komîteya Akademiya Civaka Demokratîk a Kobanê, Mesûd Bozê diyar kir ku ji pirtûkên hatin dîtin, hindek di dema niha de nayê peydakirin û destînşan kir ku ew ê li gel xwe biparêzin û wan çape bikin. *ANHA*


## 128 pirtûkên zeynelabidîn zinar



ji 1985 hetanî Adara 2018’an di demên cuda de 128 pirtûkên Zeynelabidîn Zinar hatine weşandin.
Piraniya van pirtûkan ji ber gotina qeymeqamê Êlihê (Hayrullah Yildiz) demeke ku wî bi kurdî diaxfî gote “Eşekçe Konuşma“ (Bi zimanê Keran nepeyive) derketine holê.
Li ser wê gotina Qeymeqamî, 178 roj îşkence jî li Zinarî kirine. Hin carên ku îşkence lê dikirin, qeymeqam bi xwe diçû îşkencexaneyê û temaşe lê dikir. Di gotina wî de “ziman tune, alfabe tune, pirtûk tune, ev çi parvekarî ye hûn dikin?“
Zeynelabidin Zinar jî di îşkencexaneyan de sond xwariye ku wê jiyana xwe tev di xizmeta Ziman û Çanda Kurdî de derbas bike. 128 pirtûk jî berê xizmeta wî ne ku di demên cuda de hatine weşandin.
Bi rastî eger Kurd xwedîtî li zimanê xwe bikin û wisa mîna miştaxe pirtûkên kurdî derbixin, êdî kes gotinên wisa bê exlaqî ji Zimanê Kurdî re nabêje. wê gelek qeymeqamên din jî riya qeymeqamê Êlihê bişopînin.
Ji van pirtûkên Zinarî tenê yek bi tirkî ye, yên dî tev bi kurdiya kurmancî ne. Hinek ji wan Folklora Kurdî ne, hinek berhemên klasîk in, hinek lêkolîn, werger û tîpguhetî ne.
Zinarî gotiye:
“Eger Xwedayê mezin derfet bide, wê jimara pirtûkên min bighêje 178an.“

## Serlêdanên pêşbirka wêjeyê didomin

Serlêdanên ji bo 4’emîn Pêşbirka Wêne, Çîrok û Helbestan a Şehîd Denîz Firat berdewam dike. Serlêdan wê ji aliyê komîteya amadekar ve het 25’ê Hezîrana 2018’an were qebûlkirin. Zimanê berheman wê bi Kurdî, Erebî û Tirkî be. Komîteya Amadekar a 4’emîn Pêşbirka Wêne, Çîrok û Helbestan a Şehîd Denîz Firat diyar kir ku zimanê berhaman ji bo kurdî dê bi zaravayên kurmancî, soranî û kirmanckî be.
Komîteyê destnîşan kir ku berhemên ji bo pêşbirkê werin rêkirin divê li tu cihekî din nehatibin weşandin. Beşdar dikarin di beşa helbestan de herî zêde bi 2 berheman, di beşa çîrokan de bi berhemekê û di beşa wêneyê de herî zêde bi 2 berheman beşdar bibin.
Beşdar divê berhemên xwe tevî kurtejiyana xwe herî dereng heta 25’ê hezîrana 2018’an bi rêya e-mail’ê bigihînin ber destê komîteya pêşbirkê. Ji bo agahiyên berfirehtir hûn dikarin di ser e-mailên ‘yekitiyaxwendevanenazad@hotmail.com’, ‘yekitiyaxwendevanenazad@gmail.com’ê de bi komîteyên re bikevin têkiliyê.



## 800 mamosteyan dest bi perwerdê kirin



Komîteya Perwerdê ya Rêveberiya sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê di çarçoveya amadekariyên sala nû ya xwendinê de perwerdeya 800 mamosteyan destpê kir.
Perwerdeya mamosteyan di nava bernameya amadekariyên sala nû ya xwendinê ji aliyê Komîteya Perwerdeyê ya Tebqayê ve hatiye destpêkirin. Armanc ji perwerdeya mamosteyan ew e ku asta wan di sala nû ya perwerdeyê de pêş bikeve.
Tê diyarkirin ku ev perwerdeya ku bi beşdariya 800 mamosteyan hatiye destpêkirin 5 rojan dewam bike.
Di vê derbarê de Rêveberê Komîta Perwerdeyê Hesen EL-Hac axivî û da zanîn ku armanca wan ji perwerdê ew e ku mamoste karibin baş erka xwe ya perwerdekirina xwendekaran pêk bîn in…*ANHA*

# Li Til Koçer xebatên xizmetê berdewam dikin

**Li bakurê Sûriyê xebatên civakî û xizmetguzariyê berdewam dikin. Şaredariyên bajar û navçeyan li gor derfetên xwe xebatên xizmetê bi rêvedibin. Şaredariya navçeya Til Koçer jî xebatên sererastkirina binesaziya navçeyê birêve dibe. Dema ku navçe di bin dagirkeriya DAIŞ'ê de bû binesaziya wê hatibû hilweşandin.**

Şaredariya Gel a navçeya Til Koçber a kantona Qamişlo kar û xebatên rojane dimeşîne û toreyên binesaziyê fireh dike. Navçeya Til Koçber ji aliyê şaredariyên berê ve dihate paşguhkirin. Binesaziya wê ji ber kiriyarên çeteyên DAIŞ`ê xirab bû. Ji ber vê yekê pêwîste pirojeyek salane were dayîn.

### RAKIRINA BERHMAHIYÊN ŞER

Di dema ku navçeya Til Koçer û gundewarên wê di bin dagikeriya çeteyên DAIŞ`ê de bû. Çeteyan hemû pirên li navçeyê rûxandin, bi vê yekê xwestin ku rê li pêşketina şervanên YPJ/YPG`ê bigirin.
Piştî ku navçe û gundewarên wê ji çeteyan hate rizgarkirin şêniyên navçeyê rastî gelek zehmetiyan hatin û gelek zehmetî didîtin. Li ser vê bingehê şaredariyê dest bi pirojeya xwe ya salane kir û pir bi buhaya 23 miliyon LS sererast kir.
Li ser xwesteka komînên gundê Taş Xerbî û Taş Şerqî yên dikevin başûrê navçeyê dest bi sererastkirina pira nêzî herdû gundan a ku ji ber ava baranê xirab bû, kir.
Ji aliyekî din ve jî şaredariyê hemû bermahiyên şer ji navçeyê rakir û zemîna erdê rast kir da ku daran lê biçînin.

### SERERASTKIRINA KANASLÎZASYONÊ

Sererastkirin û firehkirina toreyên kenalîzasiyonê di hundirê navçeyê û gundewarên wê de yek ji kar û xebatên di nava pirojeyên şaredariyê yên salê de ne. Di vê çarçoveyê de şaredariyê pirojeya sererastkirina toreyên kenalîzasiyonê li komîna Şehîd Demhat a dikeve navenda navçeyê bi dirêjahiya hezar û 375 M û bi buhaya 15 miliyon LS bidawî kir. Ev piroje xizmeta zêdeyî 240 malî dike. Ji aliyekî din ve jî li komîna Şehîd Evîn rêgarên kevin hatin guhertin û paqijkirin.
Li gundewarên navçeyê jî şaredariyê li ser xwesteka şêniyên gundê El-Mehmûdiyê hindek kenalîzasiyonên ne rêxistin kirî yên ku xeterî li ser jiyana şêniyan çêdikir û ji ber wan nexweşî belav dibûn, girt.

### KAR Û XEBATÊN ROJANE

Komîte û beşên şaredariyê rojane gelek xizmetan ji şêniyan re pêşkêş dikin. Werşeyên paqijiyê çopê kom dikin û ber bi cihê komkirina çopê ve dibin. Her wiha komîteya Zabîtê sûkên li bajar rêxistin dike û buha madeyan dişopîne. Komîteya Parastina Welatiyan derfet nade bazirganan ku madeyan buha bike û madeyên dem bûrî digre.
Girêdayî mijarê yek ji rêveberên şaraderiya Gel a navçeya Til Koçer Ebid Salih El-Miflih tekez kir ku wan ji Desteya Şaredariyan re gelek pirojeyên xizmetguzariyê pêşkêş kirine. *ANHA*



## Danezana aboriyê hat xuyakirin



HDP'ê danezana xwe ya aboriyê eşkere kir. Di danezanê de hate ragihandin ku AKP'ê welat xistiye nava krîzê û işaret bi bernameya aboriyê ya HDP'ê hate kirin.
Danezana Aboriyê ya HDP'ê ku ji bo hilbijartinên 24'ê Hezîranê hate amadekirin ji aliyê Hevserokê Giştî Sezaî Temellî ve bi civînekê hate eşkerekirin. Alîkarê Hevserokan ê ji Aboriyê Berpirsyar Garo Paylan û namzetê HDP'ê yê Stenbolê Erol Katircioglû jî tevlî civînê bûn.
Di danezanê de hate ragihandin ku AKP'ê rê li ber krîza aboriyê vekiriye, aboriya rantê afirandiye û hate destnîşankirin ku bi rejîma 'şexsekî' re deynê derve nikare bê dayin.
Di danezanê de hate destnîşankirin ku bi bernameya aboriyê ya HDP'ê re wê bêhn bê ber civakê û hate gotin, ji bo derketina ji nava krîzê beriya her tiştî pêwîstî bi aramiyê heye.
HDP'ê diyar kir, ku ji bo bicihanîna armancên xwe wê sê bernameyan bixin meriyetê û ji bo her sê bernameyan jî got, "Bernameya belavkirinê ya mafdar, bernameya mafên civakî û bernameya jiyana bê deyn."

## Piştgiriya Dayikên Şemiyê kirin

Meclîsa Jinê ya HDK-A Baselê, di Hefteya Têkoşîna li dijî Windayên Destgîrkirî ya Navneteweyî de, ji bo piştgiriyê bide Dayikên Şemiyê çalakiyek li dar xist.
Li bajarê Basel ê Swîsreyê, ji bo piştgirî ji Dayikên Şemiyê re bê dayin çalakiyek hate rêxistinkirin.
Meclîsa Jinê ya HDK-A Basel, bi wesîleya 17-31'ê Gulanê Hefteya Têkoşîna li dijî Windayên Destgîrkirî ya Navneteweyî li Claraplatzê çalakiya rûniştinê pêk anî û Dayikên Şemiyê silav kir.
Di çalakiyê de belavokên bi Elmanî hatin belavkirin û wêneyên windayan



hatin vekirin û ji bo windayan temsîl bike, pêlavên bê benik hatin danîn.
Berdevka HDK-A Baselê Gulderen Sevîm li vê derê daxuyaniyek da çapemeniyê û diyar kir ku windakirin li Tirkiyeyê polîtîkayeke dewletê ye.Çalakiya ku bal kişand bi qîrîna dirûşma "Yên ku winda kirine wê bi xwe winda bikin" qediya.

## Barê koçberan sivik dike



Bi vekirina Xwaringeha Kampa Eyn Îsa re barê koçberên kampê sivik dibe, nexasim di meha Remezanê de. Xwaringeh rojane 4 hezar û 500 kg xwarin û tûrbeyên nan belav dike.

Li ser daxwaza koçberên kampa Eyn Îsa, rêveberiya kampê piştî rawestandina 4 mehan û bi armanca sivikirina barê koçberan xwaringeha kampê ji nû ve vekir.
Xwaringeh rojane danê fitarê 4 hezar û 500 kg xwarin li gorî 2 hezar û 900 par bi awayekî cuda cuda li 13 hezar koçber tê parvekirin.
Her wiha 5 hezar û 300 turbe nan di her parekî de 4 nan, bi riya komînên kampê bi awayekî rêk û pêk tên belavkirin.
Di xwaringehê de 35 xebatkar, 1 xwarinpêj ji welatiyên kampê û 2 rêveber dixebitin. Xwarinên ku têne çêkirin; birînç, savar, mekarne û nîsk.
Ji rêveberên Xwaringehê Ebdulnasir El-Elî diyar kir ku xwaringeh bi armanca ku barên koçberan sivik bike hate vekirin.
Her wiha Ebdulnasir destnîşan kir ku ji ber kêmbûna derferan wan carek tenê zebze belav kirin. *ANHA*

## Rê tên sererastkirin

Di çarçoveya kar û xebatên Komîteya Şaredariyan û Hawîrdorê ya bajaroka Eyn Dîwarê de, projeya sererastkirina riya di navbera bajarok û gundê El-Zehriyê de bi hevkariya şîrketa Rojava a xizmetguzariyan hate dest pêkirin.
Di qonaxa yekemîn a projeyê de kevirên hûr li ser riya ku 20 km e tê raxistin.
Endamê Meclîsa Bajaroka Eyn Dîwar Merwan Mihemed got ku qonaxa yekemîn a projeyê ev




demeke dest pê kiriye û di qonaxa duyemîn de jî rê dê were qîrkirin.
Girîngiya sererastkirina vê riyê ew e ku 15 gundên li nêzî sînor bi bajaroka Eyn Dîwarê ve tên girêdan û pirsgirêkên welatiyan ên çûn û hatinê bi taybet di demsalên zivistanê de çareser dike.

## Navenda tenduristiyê li El-Erîşa hate vekirin





Komîteya Tendirûstiyê ya Meclîsa navçeya El-Erîşa bi armanca alîkariya şêniyên herêmê yekem navenda Tenduristiyê li navçeyê vekir.
Komîteya Tenduristiyê yekem navenda tenduristiyê li navçeya El-Erîşa vekir. Navenda Tenduristiyê dê alîkariya şêniyên 50 gundên navçeyê bike. Navend bi merasîmekê hate vekirin. Bi sedan şêniyên navçeya El-Erîşa, Şedadê û Hesekê beşdarî merasîmê bûn.Di merasîmê de yek ji rêveberên komîteya Tenduristiyê ya bajarê Hesekê Dr. Faris Hemo axivî û diyar kir ku ji ber rewşên zehmet wan navend vekir û xwestin bi vê yekê alîkariya şêniyên 50 gundî bikin. Faris Hemo destnîşan kir ku derman wê bê pere li şêniyên gundên di navbera bajaroka El-Hedîda û Qana de were belavkirin.
Endamê Meclîsa navçeya El-Erîşa Hemûd El-Elî axivî û vekirina navendê li hemû şêniyan pîroz kir.
Paşê deriyê navendê ji aliyê dayîka şehîd Xelîl El-Ehmed ve hate vekirin. Merasîm bi xelekên gevenê bidawî bû…*ANHA*

## Di qezaya tirafîkê de 13 birîndar



Di encama qezaya tirafîkê ku li ser riya di navbera navçeya Til Temir û bajarê Hesekê de pêk hat, 13 xwendekrên jin birîndar bûn.
Jinên ku ji bo ezmûnên lîseyê berê didan Hesekê, li ser rê qezaya trafîkê pêk hat. di encamê de 13 xwendekar birîndar bûn.
Hêzên Asayîşê û polîsên Tirafîkê berê xwe dan cihê bûyerê. Jinên birîndar rakirin nexweşxaneya bajarê Hesekê.
Li gorî xebatkarên tendirûsiyê yên naxweşxaneyê rewşa jinên brîndar baş e.

## Ciwanên Reqayê xwe bi rêxistin dikin





Rêveberê Tevgera Ciwanên Ereb a Reqayê Adil EL-Elî diyar kir ku ji dema navenda pêşxistina ciwanan li Reqayê hatiye vekirin gelek ciwanan navê xwe lê qeyd kirine.
Tevgera Ciwanên Ereb a Reqayê bi armanca rêxistin û pêşxistina rola ciwanan di nava civakê de bi durişmeya "ciwan pêşengên guhertina Sûriya pêşerojê ne" li gundê Sehlebiyê yê rojava Reqa lidar xist.
Civîn bi deqeyeke rêzgirtinê destpê kir, piştre li ser nave Tevgera Ciwanên Ereb a Demokratîk Adil EL-Elî axivî û bal kişand ser rola ciwanan di civakê de, her wiha da zanîn ku ciwan dikarin nifşên nû amade bikin û asta wan a pêşxistinê zêde bikin.
Di berdewama civînê de Endamê Rêveber ê Tevgera Ciwanên Ereb ê rojavayê herema Reqa Ibrahîm EL-Îsa axivî û wiha got: "Îro me ev civîn ji bo danasîn û komkirina ciwanan lidar xistiye. Armanca me ew e ku ciwan di pêşengiya civakê de karibin rola xwe ya pêşeng bigirin."
Di dawiya civînê de gelek ciwanan nave li gel Tevgera Ciwanan qeyd kirin…*ANHA*



# Jin pirsgirêkên xwe çareser dikin

**Xebatên rêxistinbûnê yên jinan li Rojava û Bakurê Sûriyê berdewam dike. Jin bi xwe pirsgirêkên xwe çareser dikin. Komîteya Lihevanînê ya Mala Jin ya herêma Cezrat a Rojhilatê Dêrazorê buye hêviya jinan û heta niha 250 doz û pirsgirêkên jinan çareser kiriye. Jinên herêmê ji komîteyê razî ne.**




Komîteya Lihevanînê ya Mala Jinê ya Herêma Cezrat a gudewarên rojhilata Dêrazorê ji roja hatiya avakirin û heta niha 250 dozên jin çareser kir.
Bi pêvajoya şoreşa Rojava re ku li Bakurê Sûriyê jî belav bû, pêvajoyeke nû bi serkêşiya jin dest pê kir. Jin di her qadên jiyanê de pêşengtiyê dikin.
Jinên herêma Cezrat a rojhilatê bajarê Dêrazorê, çend salan di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de jiyan kirin û ji her mafên xwe bê par mabûn. Di heman demê de jin bi navê Islamê de dihatin cezakirin û çarçefa reş li ser wan hatibû ferizkirin.Piştî herêm ji aliyê şervanên QSD'ê ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin, ji hêla jin ve, gelek gav hatin avêtin û gelek saziyên xweser ên jinan hatin vekirin.
Ji wan, Mala Jin a Herêma Cezrat di 15'ê Çileya 2018'an de hate vekirin. Mala jin di aliyê perwerdekirin û rêxistinkirina jinan, her wiha çareserkirina pirsgirêkên wan de xebatên mezin meşand û wekî hêviya jinên herêmê tê dîtin.
Komîteya Lihevanînê ya Mala Jinê, ji 5 jinan pêk tê, ji destpêka hatiye avakirin ve 350 pirsgirêkên jinan girt dest, ji wan 250 bi razîbûna aliyên pirsgirêkê çareser kirin, 50 radestî Dadgeha Civakî hate kirin û 50 jî hîna lêkolîn derbarê wan de têne kirin.
Endama Komîteya Lihevanînê Sebah El-Salih anî ziman ku deriyê navendê li pêşiya hemû jinan vekiriye û wiha got, "Em bi hemû hêza xwe dixebitin da ku pirsgirêkên jinan çareser bikin. Tevîî nûbûna komîteyê jî me gavên baş avêtin. Em nêrînên hemû aliyên têkildarî pirsgirêkan, digirin. Kesên ji vir derdikevin ji me razî ne."… *ANHA*





## Divê jin di nivîsandina destûrê de hebe









**Melek DEMÎRTAŞ**

Li ser banga Desteya Jin a Neteweyên Yekbûyî û bi sponseriya Meclisa jinên Sûriyê li bajarê Qamişlo forma dan û standinên jinên Sûriyê hat lidarxstin. Di formê de, kar û pêwîstiyên serke yên jinên Sûriyê hatin gotubêjkirin, her eiha girîngiya beşdarbûna jinê di nivîsandina destûra Sûriyê de jî hat nîqaşkirin.
Jinên ji tevahî bajarên Sûriyê tevlî formê bûn nêrîn û dîtinên xwe bi rojnameya me re parvekirin.

### 'DİVÊ JİN Dİ NİVÎSANDİNA DESTÛRÊ DE CİH BİGİRİN'

Endama komîteya Amedekar a Formê Kewser Kindî armanca vê xebatê diyar kir ku ji bo pêşxistina jinê gaveke girînge û wiha axivî: hemû rêxistin û saziyên jin li Bakurê Sûriyê, her wiha yên Xweser ji bilî Efrîn û Şehba beşdarî vê formê bûn. di nav nîqaşan de girîngiya çalakirina xebatên jinê di hemû qadên jiyanê de, her wiha girîngiya beşdarbûna jinê di nivîsandina destûra Sûriyê de.
Kewser di dawiya axaftina xwe de got: em ê van mijaran radestî Desteya jinê ya NY'ê kirin. Ta ku projeyên jinan ber bi çav bê girtin û dengê wan hebe.

### 'EM Jİ BO ÇARESERİYA PİRSGİRÊKÊN JİNÊ KOM BÛN'

Cîgira Berdevaka gîştî a MSD'ê jin Sîham Qiryo diyar kir ku armanca wan ji tevlîbûna formê xurtkirina rola jinê ye û wiha got: "Di salên aloziya Sûriyê de, jin rastî destdirêjiya cinsî û derûnî, her wiha destirêjî li cenazeyên wan hatin kirin. Lewra başdarbûna jinên Sûriyê di formê de ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan girînge."
Sîham dazanîn ku formeya danûstandinê û pêşniyarên jinên Sûriyê li Lubnanê hatibû lidarxistin; lê wekî jinên rojhilatê bakurê Sûriyê cara yekemîne li herêmê xwe li hev kom dibin. Sîham bang ji jinan kiri ku xwedî li xwe derkevin û di derbarê zagonên parastina jinê de tekoşînê berdewam bikin.

### JINÊN BAJARÊN NÛ RIZGARKIRÎ JÎ TEVLÎ BÛN

Endama Bîroya Kar û Barên Rêxistina jinê ya bajarê Qamişlo Sîlva Ibrahîm destnîşan kir ku di encamê nîqaşan de pirsgirêk û pêwîstiyên serke yên jinan hatin tesbîtkirin.
Sîlava dazanîn ku jinên herêmên mîna Tebqa, minbi û Reqayê yên ku gelek zordarî dîtin bi awayek çalak beşdarî formê bûn, pêşniyar û nêrînên xwe jî anîn ziman.

## Şehadet nirxek giranbuha ye





Fermandarên YPJ'ê li ser Meha Gulanê û berxwedêrên destpêkê yên jin ên YPJ'ê axivîn, ku di nav refan de jiyana xwe ji dest dane.
Fermandaran diyar kirin şehîdbûna di ber azadiyê de nirxek û rûmeteke pir mezin e.
Fermandarên Yekîneya Jinê (YPJ) li ser meha Gulanê, ku weke Meha Şehîdan tê naskirin axivîn û berxwedêrên pêşî yên YPJ'ê bi bîr anîn.
Fermandara YPJ'ê Rojda Efrîn li ser meha Gulanê wiha axivî: "Meha Gulanê rastiya hebûna birûmet û binirx e. Meha gulanê meha şehîdan e û di nav dîrokê de berxwedêrên azadiyê bi heqîqeta şehîdbûnê û têkoşîna xwe hatine asteke pir bilind. Jin her dem di jiyanê de hatin çewisandin lê bi heqîqeta YPJ'ê re têkoşîna jinê xwe dîsa nû kir. Di dîroka Kurdistanê de jinên wekî Zarîfe, Besê, Leyla Qasim, Mîna Qazî, Gulnaz Xanim ji siberoja gelê Kurd re bûn ronahî û bi têkoşîna xwe mohra xwe li dîrokê xistin. Ew şopdarên heqîqetê bûn û dîrok ji nû de dan nivîsandin. Em ê jî şopdarê wan û şopdarên şehîdên meha gulanê bin û têkoşîna wan biparêzin. "
Fermandara YPJ'ê Zinarîn Kobanê jî wiha got, "Di şexsê hevalên Mizgîn û Aytenê de em têkoşîna Şehîdên Gulanê bi bîr tînin. Îro YPJ bi dilekî pak û têkoşer rêya şehîdên gulanê dişopîne û YPJ îro bi têkoşîna xwe ya bêhempa li cîhanê tê nasîn. YPJ ji nirx, maf û jiyana hemû jinên cîhanê re xizmetê dike. Îro em bi şopandina rêya şehîdên xwe û bi felsefeya Rêber Apo xwe bi rêxistin dikin û axa xwe diparêzin. Heta em hatin vê astê me bedelên gelek mezin dan lê me tu carî dev ji têkoşîna xwe berneda. Hêzên enternasyonalîst jî feyzê ji me digirin û îro cihê xwe di nav me de digirin. Kesayetên wek heval Hêlîn, Amara Ereb, Viyan Qamişlo, Zîlan Ereb her dem di pêş de cihên xwe digirtin. Emê xwedî li têkoşîna şehîdên xwe derkevin û ala wan hilgirin."

## Ji Heyva Sor banga hestiyariyê



Xebatkara Heyva Sor a Kurd Mejdolîn Sîno banga hestiyariyê li hemû saziyên mafê mirovan kir ku deng bidin gelê Efrînê yên ku li Kampên Şehbayê bi cih bûne.
Mejdolin wiha got: "Gelê Efrînê yên ku li Kampên Şehbayê bi cih bûne tevî hemû zehmetiyan berxwe didin. Lê divê hemû saziyên mafên mirovan ên navneteweyî piştgiriyê bidin vê berxwedanê."
Xebatkara Heyva Sor a Kurd Mejdolîn Sîno wiha got: "Gelek pêdiviyên gelê Efrînê yê ku li Kampên Şehbayê bi cih bûne hene, ji ber kêmasiya dermanan û şert û mercên dijwar nexweşiyên cuda belav dibe. Divê hemû cîhan dawî li bêdengiya xwe bînin û deng bidin gelê Efrînê yê ku li Kampên Şehbayê bi cih bûne."
Mejdolînê da zanîn ku ew bi derfetên kêm hewl didin ku hemû pêdiviyên gel bi cih bînin û got: "Heta roja îro me wekî Heyva Sor a Kurd hewl da ku em hemû pêdiviyên Gelê Efrînê yên di kampan de bi cih bînin. Lê ji ber ku derfet kêm e, derman kêm e gelek nexweşî belav dibin û herî zêde jî zarok di bin bandora vê yekê de dimîne. Her wiha ji ber ku her diçe hewa germ dibe ev jî dibe sedem ku nexweşî bêtir belav bibin û nexweşiyên cuda derkevin holê."
Mejdolînê diyar kir ku jinên ducanî jî di nav rewşek zehmet de ne û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ji ber ku alavên tenduristiyê û derman kêm in jinên ducanî dema ku diwelidin gelek zehmetiyan dikişînin. Divê ev zor û zehmetiyên ku gêlê Efrînê yên di kampan de dijîn ji aliyê hemû cîhanê bê dîtin û dawî li vê bêdengiyê bê."…*JINNEWS*

## Divê em têkoşîna xwe bilind bikin



Hevşaredara Cizîrê Leyla Îmret di çarçoveya karê hilbijaritnê de li Darmstadtê di civîna gel de axivî û got, "Ev hilbijartin ji bo diyarkirina çarenûsa civakê, gelekî girîng e."
Ji bo wezîfedarên di dema dengdanê de bi erk û berpirsyarî rabin li bajarê Essen ê Elmanyayê civînek hate lidarxistin. Di civînê de amadekariyên ji bo hilbijartinê hatin nirxandin û hate ragihandin ku wezîfedarên hatine tespîtkirin wê li ber sindoqan bin û muşahîtiyê bikin.
Di civînê de hate destnîşankirin ku ji bo AKP-MHP nikaribe dek û dolaban bigerînin, divê sindoq bi xurtî werin ewlekirin û hate gotin, welatiyên li Essen, Dortmund, Hagen, Gelsenkirchen û Velbertê wê rojên dengdanê wezîfedar bin.
Li bajarê Darmstadt ê Elmanyayê, ji bo hilbijartinên 24'ê Hezîranê li Navenda Civaka Demokratîk a Kurd civîneke gel hate lidarxistin. Hevşaredara Cizîrê Leyla Îmret beşdari civînê bû û rewşa siyasî û atmosfera hilbijartinê ya li Tirkiyê nirxand.
Îmret diyar kir ku ev hilbijartin ne tenê ji bo Kurdan, lê ji bo paşeroja hemû civakê gelekî girîng e û bang li her kesî kir ku bi hemû hêza xwe tevlî bibin."
Îmret got, "Gelê me divê bi ruhê seferberiyê ji bo Selaheddîn Demîrtşa bixebite û em têkoşîna xwe ya demokrasiyê bigihînin asta herî bilind. Bi vî rengî em ê karibin bi ser bikevin."

# Gêrîla wê Pêngava 1’ê Hezîranê bike meşa azadiyê

*Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG’ê bi wesîleya salvegera Pêngava 1’ê Hezîranê peyamek weşand û diyar ku, di sala 15’an a Pêngava 1’ê Hezîranê de, Gerîlayên Azadiya Kurdistanê yên xwedî tecrûbeya 35 salan wê bi ruhê fedayî yê Apocî bi erk û wezîfeya xwe rabin.*



Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG’ê bi wesîleya salvegera Pêngava 1’ê Hezîranê peyamek weşand û got, “Gelê Kurd wê armanca xwe ya ji bo Kurdistana azad û Rojhilata Navîn a demokratîk bi ser bixîne.”

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel bi wesîleya 14. salvegera Pêngava 1’ê Hezîranê daxuyaniyeke nivîskî weşand û salvegera pêngava ku li dijî konsepta înkar û tasfiyeyê ji bo Kurdistana azad û Tirkiyeya demokratîk dest pê kir, li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gel û hemû hêzên têkoşer pîroz kir.

Di daxuyaniyê de hate gotin, “Ji afirînerên vê gava dîrokî hevrê Erdal, Adil û Nûda heta Delal Amed, hemû şehîdên şoreşê yên ku destana lehengiyê afirandin, bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Bi vê wesîleyê, soza ku me daye wan em careke din dubare dikin.”

Di dewama peyamê de hate gotin, “Pêngava dîrokî ya 15’ê Tebaxê ku pêngava herî girîng a dîroka têkoşîna me ye û di hebûna gelê Kurd de roleke xwe ya mezin heye, pêşî li qirkirina gelê Kurdistanê girt û meseleya Kurd raxist pêş çavan. Vê pêngava dîrokî, Rastiya Gelê Kurd û Meseleya Kurd ku ser wê dihate nixumandin, xiste rojeva Tirkiye û cîhanê. Piştî ku ev pêk hat, Rêber Apo di Newroza sala 1993’an de dest bi pêvajoyeke nû kir û çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd weke alternatîfeke girîng xiste rojevê. Rêber Apo salên 1993, 95 û 98’an bi rêya agirbestê li çareseriyeke demokratîk geriya, lê belê feraseta dewleta mêtinger û qirker a Tirk timî bi tinekirin û tasfiyeyê bersiv da. Êrîşên li dijî tevgera me û gelê me, bi şêweyê kompolya navneteweyî ya li dijî Rêberê me derxist asteke bilind. Tevî vê yekê jî Rêberê me 2’ê Tebaxa 1999’an dest bi pêvajoyeke nû û bingehîn kir. Tevgera me li ser bingeha vê pêvajoyê kete nava demeke bêçalakiyê ya yekalî. Pênc salan bi ti awayî çalakiyeke leşkerî nehate kirin. Sedema van hemû hewldanan ew bû, ku ji bo çareseriya demokratîk û aştiyane ya doza Kurd zemînek bê avakirin û aştiyeke mayinde bê afirandin. Rêber Apo pênc salan gelekî hewl da. Gelek deklarasyonên çareseriyê ji aliyê Rêberê me û tevgera me ve hatin weşandin. Lê belê tevî van hemû hewldanan jî dewleta Tirk dest ji zîhniyeta xwe ya qirker, mêtinger û înkarê berneda û polîtîkaya xwe ya tinekirinê bi biryardarî dewam kir. Di siyaseta tasfiyeyê de israr kir ku armanca kompolya navneteweyî bû. Qîma xwe bi vê jî neanî û bi destê komeke çete xwest ji hundir ve li tevgera me bixe û bi temamî tasfiye bike.

Ev zîhniyeta mêtinger û qirker ku pişta xwe dida desteka kompolya navneteweyî, piştî sala 2002’an ji aliyê AKP’ê ve ku bû desthilatdar, hîn bi rengekî zexel û namerdî hate meşandin. Li dijî vê yekê, tevgera me li ser bingeha xeta parastina rewa dest bi Pêngava 1’ê Hezîranê kir. Ev pêngav gelekî dîrokî bû, kevneşopiya berxwedanê ya 15’ê Tebaxê gihand asteke nû û weke pêngaveke ji bo serketin û azadiyê kete meriyetê. Di berxwedana gerîla û serhildana gelê me de ku bi Pêngava 1’ê Hezîranê re dest pê kir, gelek destanên lehengiyê hatin afirandin, kompolya navneteweyî hate tevizandin û hemû êrîşên tinekirinê polîtîkayên zexel û mêtinger ên AKP’ê hatin pûçkirin. Li dijî Sîstema Êşkenceyê ya Îmraliyê, Rêber Apo bi sebir û îradeyeke awarte li ber xwe da, îradeya mirovekî azad nîşan da, gelê me û siyaseta Kurd bi fedakariyeke mezin li ber xwe da û jin û ciwanên Kurdistanê li nava refên HPG’ê bi ruhê fedayî yê Apoyî bi rengekî dîrokî li ber xwe dan.

Li ser bingeha vê berxwedanê, Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê îro gihîştiye asta çareserî û encamgirtinê. Ev berxwedana ku li dora paradîgmaya Rêber Apo hate kirin, şoreşa Kurdistanê kir şoreşa Rojhilata Navîn û ev têkoşîn veguherand hêviya gelan. Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê ku îro li çar parçeyên Kurdistanê û herêmê belav bûye, bi pêngaveke mezin sala 15’an a Pêngava 1’ê Hezîranê ya dîrokî pêşwazî dike. Ne tenê li Bakurê Kurdistanê, dewleta AKP-MHP’ê ya faşîst li dijî desketiyên gelê me yên li hemû parçeyan bi awayekî bê pîvan û bê sînor êrîş dike.

Gelê me wê li dijî vê êrîşkariyê, bi berxwedana li Bakur, Başûr û Rojava bi berxwedana xwe bersiva pêwîst bide zîhniyeta qirker mêtinger. Û wê armanca xwe ya Kurdistana azad, Rojhilata Navîn a demokratîk bi ser bixîne.

Di sala 15’an a Pêngava 1’ê Hezîranê de, Gerîlayên Azadiya Kurdistanê yên xwedî tecrûbeya 35 salan wê bi ruhê fedayî yê Apoyî bi erk û wezîfeya xwe rabin. Felsefeya Rêber Apo, xeta şehîdên me yên leheng wê her tim ji bo hêzên me yên gerîla bibin çavkaniya bingehîn a hêzê û bi vê hêzê wê serketin misoger bibe. Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ku wê ji aliyê taktîk û teknîkê ve bi rengekî profesyonel tevbigerin, wê têkoşîna sala 15’an a Pêngava 1’ê Hezîranê bikin meşa Rêberê Azad û Kurdistana Azad. Wê timî berê xwe bidin serketinê. Em pê bawer in ku di vê dema dîrokî de wê ciwanên Kurdistanê û gelê me yê welatparêz bi erk û berpirsyariya xwe rabin û ji tevahiya gelê me û Gerîlayên Azadiya Kurdistanê re di sala nû ya têkoşînê de serketinê dixwazin.”

## AKP ji jinan û ji HDP’ê ditirse



Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Bûldan bal kişand ser polîtîkayên AKP’ê yên dijminatiya li jinan û got, “Jin wê mohra xwe li hilbijartinên 24’ê Hezîranê bixin.”

Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Bûldan tevlî merasîma vekirina Buroya Hilbijartinê ya Jinan a li Sancaktepe ya bajarê Tirkiyê Stenbolê bû.

Bûldan li vir axivî û got, “Jin ku nîvê civakê ye, timî ji nedîtî ve hatin. Têkoşîna me ya wekheviyê timî nedîtin. Beden, ked û nasnameya me bi her awayî hatin talankirin. Hê jî ev talan dewam dike.”

Bûldan bi bîr xist ku jin herî zêde di vê serdemê de hatin kuştin û got, “Jin herî zêde di vê demê de mexdûr bûn. Her tiştên me înkar kirin. Dest li kincên me, li hejmara zarokên me, li makjaya me werdan. Hewl dan me li malê bikin hepsî. Lê belê me got ku em ê zilm û zexta kesî qebûl nekin. Li her cihî, li kolanan, li kargehan, li meydanan em têkoşiyan.”

Bûldan da xuyakirin ku parlamenterên jin herî zêde di nava HDP’ê de hene û wiha dewam kir: “Ji ber ku HDP partiyeke jinan e. Ji ber ku em partiyeke jinan e, ji ber ku em mafên jinan diparêzin, ji ber ku em ji bo wekhevî û azadiya jinê têdikoşin, ji me ditirsin.”

Bûldan destnîşan kir ku AKP ji jinan, ji HDP’ê ditirse û wiha dewam kir: “Lewma Fîgen Yuksekdag, Sebahat Tûncel, Gultan Kişanak li girtîgehê ne. Parlamenterên jin girtin û li şûna hevşaredarên me jî qeyûm bi cih kirin. Êrîş birin ser saziyên jinan. Lê belê em soz didin ku ev têkoşîn wê mezin bibe. Têkoşîna jinan a wekhevî û azadiyê ku li kolanan, li meydanan dikin, wê mezintir bibe. Ji ber ku jin hene, jinên azadîxwaz û wekhevîxwaz hene.”

Di dewama axaftina xwe de Bûldan got, “Em soz didin hevrêyên xwe yên li girtîgehê. Em soz didin Gultan Kişanak, Çaglar Demîrel, Fîgen Yuksekdag, Sebahat Tûncel. Hûn ê di 24’ê Hezîranê de bi hêza jinê azad bibin. Jin ji 24’ê Hezîranê re amade ne. Jin wê 24’ê Hezîranê dengê xwe bidin û xwedî li sindoqan derkevin. Yên ku mohra xwe li hilbijartinên 24’ê hezîranê bidin jin in, jinên azadî û wekhevîxwaz in.

Heta roja hilbijartinan li malan, li kolanan em ê bixebitin. Em ê ji her kesî re bêjin; bila êdî AKP welêt bi rê ve nebe, bila Recep Tayyîp Erdogan biçe mala xwe û li ber neviyên xwe be.

Yên ku vî welatî bi rê ve bibin hene. HDP û Selaheddîn Demîrtaş wê vî welatî bi rê ve bibin. Selaheddîn Demîrtaş dîl girtine, ji ber ku ji cesareta wî ditirsin. Lê belê heta ku jin hebin wê rêzdar Selaheddîn Demîrtaş bibe Serokkomarê vî welatî.”

## Hemû Kurd li dora HDP’ê dicivin



Namzeta HDP’ê ya Colemêrgê Leyla Guven ku dîl girtî ye, diyar kir ku Kurdên beriya niha deng dabûn AKP’ê ji ber sûcên dewletê yên li Kurdistanê kiriye êdî li dora HDP’ê dicivin.


Hevseroka Civaka Demokratîk KCD’ê û namzeta parlamenteriyê ya Colemêrgê Leyla Guven ku dîl girtî ye, bal kişand ser operasyonên qirkirina siyasî û got, “Bi hezaran hevalên me yên hêja li Kandira, Amed, Sîlîvrî, Şakran, Edîrne, Sîncan û gelek girtîgehên din dîl tên girtin. Ev yek nîşan dide bê desthilatdariya heyî çiqasî ji vê kevneşopiya siyasetê ditirse û nikare xwe lê rabigire.”

Guven da xuyakirin, ku AKP’ê hemû kredî û çavkaniyên li Kurdistanê qedandiye û got, “Em zanin ku Kurdên beriya niha dengê xwe didan AKP’ê di vê hilbijartinê de wê deng nede wan. Mirovên vê herêmê bi çavên xwe dîtin bê AKP’ê salên dawî teroreke çawa li Kurdistanê kir. Şaredariyên hatin desteserkirin, derxistina ji kar a karkeran, operasyonên qirkirina siyasî, girtina saziyan, kedkarên ji kar hatin avêtin, goristanên hatin xwerakirin, cenazeyên hatin teşhîrkirin. Bêguman gel wê vê zilmê ji bîr neke. AKP wê roja 24’ê Hezîranê çem û çem biçe.”

Guven li ser encamên hilbijartinê pêşdîtina xwe parve kir û got, “Ji rojava heta rojhilatê Tirkiyê, ji başûr heta bakur civak wê desteke bide HDP’ê. Wê Meclîsê bêyî HDP’ê nehêle.”

Leyla Guven bal kişand ser şert û mercên girtîgehê û got, bi bahaneya Rewşa Awarte bersiv ji gelek daxwazên wan ên bingehîn re nayê dayin, li qewîşa 22 kesî 32 kes dimînin û belasebep nayên berdan. Guven destnîşan kir ku tevî vê yekê jî ew bi coş in, bi moral in…*MA*

## Li Ewropayê mal bi mal digerin



Hevserokê KCDK-E Yuksel Koç li ser karê hilbijartinê yê li Ewropayê agahî da û diyar kir ku ew bi 8 hezar kesî kar dikin. Koç got, “Armanca me ew e ku ji 7’ê Hezîranê gelekî zêdetir dengan bigirin.”

Koordînasyona HDP’ê ya Hilbijartinê ku 22’ê Nîsanê ava bû, li 26 welatên Ewropayê û ji Japonyayê heta Kanadayê ji bo hilbijartinê karekî berfireh dike. Endamê koordînasyona hilbijartinê Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) Yuksel Koç destnîşan kir ku bêyî cihêkariyê bikin ew xwe digihînin hemû dengdêran û got, “Bi moral û motîvasyoneke mezin em mal bi mal digerin û bi vî rengî karê hilbiljartinê dikin.” Koç destnîşan kir ku HDP wê li Ewropayê dengekî gelekî zêde bigire. Koç da xuyakirin ku di çarçoveya plansaziya lêpirsîn û qeydkirina dengdêran, qezençkirina dengdêrên nû û birina ser sindoqê ya dengdêran de wan dest bi kar kirin û li her wleat, bajar û semtan komîsyon ava kirin. Koç destnîşan kir ku ew dixwazin biçin serdana hemû malan û bi dengdêran re biaxivin. Yuksel Koç diyar kir ku ew li 26 welatên Ewropayê, li Kanada, Amerîka, Japonya, Awûstûralya û gelek navendên din ên cîhanê ji bo hilbijartinê kar dikin û got, “5 hezar û 300 kes di nava komîsyonên hilbijartinê de cih digirin. 2 hezar kes wê muşahîd bin, 312 kes jî li ser sindoqan wezîfedar bikin. Em niha 8 hezar kes ji bo HDP’ê karê hilbijartinê dikin. Li hemû bajar û semtan moral û motîvasyoneke xurt heye. Ev yek jî rê li ber kelecanekê vedike ku ji ya 7’ê Hezîranê jî xurtir e.”



# Modela Rojava demokratîk û bedew e

*Heyeta ji Elmanyayê ku parlamenter, akademîsyen û rojnamevan jî di nav de ne, li Rojava hevdîtinan dewam dike. Endamê heyetê derhêner û fîlmçêker Peter Ott got, “Li Rojava xwerêveberiya li ser bingeha nirxên demokratîk û wekheviya jin-mêr gelekî bedew û bi bandor e. Kêmasî timî tên çareserkirin, yanî modeleke ku timî xwe nû dike.”*




Derhêner û fîlmçêker Peter Ott ku di nava heyeta ji 11 kesî de cih girt ku ji Elmanya çû Rojava got, “Berevajî hemû welatên Rojhilata Navîn gelekî girîng e ku li Rojava bertîl nîne. Modela civaka demokratîk a li Rojava bedew e.”

Heyetek ji Elmanyayê ku parlamenter, akademîsyen û rojnamevan jî di nav de ne, ji roja Duşemê ve li Rojava hevdîtinan dike. Heyeta ku li Qamişloyê bi rayedarên Kantona Cizîrê re rûniştin, piştî Kobanê berê xwe dan Amûdê û Minbicê.

Heyeta Elman wê hefteyekê li Rojavayê Kurdistanê û Bakurê Sûriyê bimîne. Heyet dixwaze Efrîniyan jî bibîne ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk li Kampa Penaberan a Şehbayê ne. Endamê heyetê derhêner û fîlmçêker Peter Ott got, ew li bendê ne ku ji bo Şehbayê destûr ji wan re bê dayin.

Ott li ser serdana heyetê û çavdêriyên xwe axivî û got, “Hêvîdar im wê rejîma Esad destûrê bide ji bo em derbasî herêma Şehbayê bibin.” Ott her wiha derhêner û senarîstê fîlmê bi navê “Das Milan-Protokol” e ku qala têkoşîna YPG/YPJ’ê ya li dijî DAÎŞ’ê dike. Fîlm destpêka vê salê li Elmanyayê kete vîzyonê.

Peter Ott got, “Bêguman ji bo ger û guhdarîkirina li tecrûbeyên li vê derê, hefteyek demeke kin e. Di vê demê de me tenê hin tecrûbeyên giştî girtin. Lê divê vê yekê bêjim; xwerêveberiya li ser bingeha nirxên demokratîk û wekheviya jin-mêr gelekî bedew û bi bandor e.

Ji ber du sedeman ez vê yekê dibêjim. Ya yekemîn; ev model li herêmekê tê avakirin û şer lê diqewime. Ya duyemîn; kêmasî timî tên çareserkirin, yanî modeleke ku timî xwe nû dike. Nuqteyeke din jî ew e ku berevajî hemû welatên Rojhilata Navîn, li vê derê bertîl nîne. Ez bûm heyranê vê yekê.”

Derhêner Ott diyar kir ku wî xwestiye, di demekê de ku sîstema kapîtalîst serdest e, modela jiyan û rêveberiya alternatîf a li Rojhilata Navîn bi çavên xwe bibîne û got, “Ev projeya dîrokî bala min dikişîne. Û gelekî kêfxweş im ku niha firsend bi destê min ketiye ku dibînim.”

Derhêner û fîlmçêker Ott destnîşan kir ku piştî vegeriya Elmanyayê wê tecrûbeyên xwe yên li Rojava bi çalakî, rê û rêbazên cuda vebêje û got, “Ez vê gerê weke lêgerîna li projeyên nû dibînim.” Peter Ott herî dawî diyar kir, gelek tişt hene ku entelektuelên li Elmanyayê dikarin ji Rojava hîn bibin.

Endamekî din ê heyetê, rêveberê Partiya Çep Jan van Aken jî du roj berê bi daxuyaniyekê bi bîr xistibû ku ew sala 2014’an jî hatibû serdana Rojava û di navbera rewşa wê wextê û ya îro de cudahiyeke mezin heye. Aken bal kişand ser bîrên petrolê yên dixebitin û pêşketina li qada çandiniyê û got, “divê Rojava hîn bêhtir bikeve rojeva Elmanyayê.”…*ANF*

## Li hember êrîşan divê em yekîtiyê ava bikin




Sekretêrê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno bang li aliyên Kurd kir ku li dijî kompolyên dagirkeriya Tirkiyê yên li hemberî gelê Kurd Kongreya Netewî ya Kurdistanê li dar bixin.

Dewleta Tirk a dagirker di demê dawî de bi armanca qirkirinê êrîşên xwe yên li dijî Başûr, Bakurê Kurdistanê, zêde kirine, di heman demê de, kiryarên xwe yên hovane yên li Efrînê û guhertina demografiya herêmê didomîne.

Derbarê planên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî gelê Kurd û divê gelê Kurd li hember van polîtîkeyan çi bike, Sekretêrê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno axivî û anî ziman ku dijminên gelê Kurd wekî biratî anî cîrantî li Kurdan nanere, armancên wan ew e ku berjewendiyên xwe di herêmên Kurdan de pêk bînin.

Kovan Keno kompolyên ku piştî şoreşên Kurdî hatine kirin bi bîr xist û got, “Ji Şoreşa Şêx Seîd û heta kompolya 15‘ê Sibatê ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, komplo di dagirkirina Efrînê de û heya destwerdana di Başûrê Kurdistanê didome.”

Kovan Keno anî ziman ku dagirkeriya Tirkiyê ne tenê partiyekî yan jî yek fikirî hedef digire û got, “Armanca dewleta Tirk ew e nasnameya Kurd ji holê rake. Her kurdekî li kuderê be wekî dijminê xwe dibîne.”

Sekretêrê Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê Kovan Keno, di dawiya axaftina xwe de bang li partî û rêxisitnên Kurd kir ku nakokiyên xwe deynin aliyekî û Kongreya Netewî ya Kurdistanê li dar bixin û bi yekîtiyê bersiva dagirkeran bidin.”…*ANHA*

## Betalkirina hilbijartinan li dijî destûra bingehîn e



Serokkomarê Iraqê Fûad Masûm îdîa kir ku betalkirina beşek ji encamên hilbijartina 12’ê Gulanê li dijî Destûra Bingehîn e.

Di daxuyaniya ofîsa Serokkomariya Iraqê de hate gotin, “Parlamenta Iraqê berî du rojan biryar da ku beşek ji encamên hilbijartinê bên betalkirin û beşek ji encaman jî bi dest bên jimartin. Bi ya me, ev biryar li dijî Destûra Bingehîn e.”

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku Dadgeha Federal a Iraqê divê li ser mijarê daxuyaniyekê bide.

Parlamenta Iraqê di rûniştina 28’ê Gulanê de biryar dabû ku temamiya dengên li derveyî welat hatine dayin û encama dengdana li kampên koçberan ên li Enbar, Selahaddîn, Mûsil û Diyalayê bên betalkirin. Her wiha 10 ji sedî yê encama dengdanê jî bi dest were jimartin.

Komîsyona Hilbijartinê ya Bilind a Serbixwe ya Iraqê bi daxuaniyekê ragihand ku dengên li 954 navendên dengdanê yên li gelemperiya Iraqê û 67 navendên dengdanê yên li derveyî welat, bi giştî dengên li 1.021 navendan hatine betalkirin.

Li gorî encamên dawî yên hilbijartina parlamenta Iraqê ku 12’ê Gulanê hate kirin, koalîsyona Saîrûn a bi serkêşiya Muqteda Sadr 54 wekîl, koalîsyona Fetîh 47 wekîl, koalîsyona Nasir a bi serokatiya Haydar Ebadî jî 42 wekîl bi dest xistin…*ANF*

## Divê ciwanên Rojhilat beşdarî gerîla bibin

Mazlûm Heftan diyar kir ku yek ji mijarên ku kompolya li ser Ocalan têkbir, beşdarbûna keç û xortên Rojhilatê Kurdistanê ya nav refên gerîla bû.

Endamê Desteya Rêveber a KODAR’ê Mazlum Heftan di derbarê girîngî û xwedî derketina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de axivî. Mazlum got; “Çawa ku gelê Kurd bi taybet jî gelê Rojhilatê Kurdistanê di sala 1999’an de xwedî li Rêber Apo derketin û daketin qadan divê carek din jî xwedî rêberê xwe derkevin û dest bi çalakiyan bikin.”

Mazlum Heftan di dewama axaftina xwe de balkişand ser giringiya fikrê Ocalan û wiha pêde çû; “Rêber Ocalan ji bo gelê Kurd û gelê azadîxwaz, fikir û felsefeya jiyana nû û civakek nû afirandiye. Rêberek rastiye û dîrokiye. Ev fikir û îdeolojiya wî kir ku jin, ciwan, pîr û zarok bi hevre dibêjin ‘Bê Rêber Apo jiyan nabe.’ Rêber Apo nûnerê rast yê modernîteya demokratike. Li dijî vê yekê çi li Kurdistan be, çi jî li derve be li dijî vê sîstemê dijmin hemû bûne yek. Ji bo vê divê hemû kesên xwedî fikrê azad, li hember siyaseta ku li ser Rêber Apo û gelê Kurd tê meşandin derbikevin û hişyarbin.”

Heftan behsa kompolya navnetewî ya li dijî Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan hat kirin jî kir û got; “Yek ji mijarên ku kompolya li ser Ocalan têkbir, beşdarbûna keç û xortên Rojhilatê Kurdistanê ya nav refên gerîla bû. Di roja me ya îro de jî divê bi heman rihî li Rêber Apo xwedî bê derketin. Ez daxwazê ji ciwanên Rojhilatê Kurdistanê dikim da ku tevlî nava refên gerîla bibin.”

Endamê Desteya Rêveveber a KODAR’ê Mazlum Heftan di dawiyê de wiha got; “Çawa ku di sala 1999’an de ciwan, jin, pîr û zarok ji Çaldiran heya Rusya daketin qadan û piştgiriya Rêber Apo kirin, divê îro jî bi heman awayî piştevaniya Rêber Apo bikin. Ya ku dijminên Kurdan di sala 1999’an de nekarîn bikin, îro bi awayên cuda dixwazin bikin.”…*ROJNEWS*



## Bazar û Bazirganî



Mihemed SEYDÎ

23’yê Çile ya 2017’an aliyên nû ketin bazareke nû ya bi navê Astana û raste rast dest bi kirîn û firotinê kirin.

23’yê Çile 2017 tora yekem a Astana bi garantoriya Rûsya, Tirkiye û Îranê hat lidarxistin.

Bi vê yekê re, Li Sûriyê rewşeke nû û rojeveke nû derket, ew jî radestkirina hin herêman an jî dest guhertina hin herêman bû. Ger gotin di cih de be destûrdayîna ku hêzeke dagirker eşkere parçeyekî axa sûriyê dagir bike û dest bi guhertina demografîk li herêmê bê kirin. Ev lihevkirina ku di bin navê herêmên kêmkirina şer an jî kêmstrês dihat bi navkirin dest pê kir, riya dagirkeriya Tirk bi 12 qereqolan ( nûqteyên çavdêriyê) pêk hat. Lihevkirina destpêkê heta Astana 9 dewam kir. Bazariyan ji vir dest pê kir û Îran, Rûsya û Tirkiya bûn bazirganên sereke. Navê guhertina demografîk kirin çareseriya aloziyê, komkujiyên dihatin kirin parastina ewlehiya sînor û kuştina sivîlan jî bû dawî anîna li Terorê.

Hemû kiryar û bûyer bi çareseriya aloziyê dihate bilêvkirin û navkirin. Li ser navê gelê Sûriyê axa Sûriyê bêyî ku nûnerên gelê Sûriyê hebin, di komcivînan de dihate dabeşkriin. Aliyên ku eşekere navê wan derbas dibû û serkêşiya van pîlanan dikirin Rûsya, Tirkiya û Îran bûn û heta Astana 9 ev pîlanên xwe bi rêve birin. Piştî ku herêmên Xutaya Rojhilat û başûr Şamê hatin valakirin û bi hezaran çete û malbatên wan li herêmên ji aliyê dewleta Tirk ve dagirkirî hatin bi cih kirin û rê hat dayîn Efrîn were wêrankirin, êdî nakokî derketin holê û mezintir bûn. Êdî her kes behsa hebûna Îranê li herêmê dike û dibêjin divê ji herêmê bê qewitandin.

Gelo Çima heta niha ji hêzên ser bi Îranê re nedigotin ku divê ji herêmê derkeve û ew dikirin aliyekî bazarê? Rêjîmê gelek herêm bi desteka Hêzên Îranê kontorl kirin, lê Îranê li vir çi bi dest xist ku niha hemû alî li dijî wê ketine nava tevgerê û dixwazin hebûna wê li nava Sûriyê lewaz bikin. Rûsiya û Emerîka li ser Îranê li hev dikin û rê tê dayîn ku baregehên wê û binkeyên wê yên leşkerî werin bombebaran kirin.

Rûsya ne tenê rê dide ku hêzên Îranê werin hedef girtin, lê bi mijara ku ew ê sîstema hewayî ya S-300 bidin Rêjîmê, rasterast weke daweteke ji bo Îsraîlê bû ku êrîşî Îranê li nava axa Sûriyê bike.

Li vir Armanca Rûsya an jî berjewendiyên wê ji rêdayîna êrîşên li ser Îranê çawa tên dîtin û fêmkirin?

Rûsya dibîne ku çiqas êrîş li ser Îranê çêbibin, ew ê Îran xwe bavêje bextê wê û mihtacî wê bibe. ji wê yekê ye ku her cara êrîş pêk tê Rûsya bê helwest dimîne.

Êdî Îran jî ketiye wê ferqê ku kengî berjiwendiyên Rûsya bixwaze wê Îranê bifroşe. Di heman demê de ger em bala xwe bidin hevalbendê Îranê, Rêjîma Sûrî jî, ew li hember daxwaze Rûsya ya vekişîna Îranê ji Sûriyê tenê bi daxuyaniyên şermok re bi sînore. Dewleta Tirk jî li heman dahola Rûsya dide û bi vê yekê dor li Îranê teng dibe.

Ya ku tê dîtin ew e ku aliyên ku bazarê li ser axa Sûriyê û gelê Sûriyê dikin êdî dem hatiye ku bazarî li ser wan bi xwe jî bê kirin. Îran jî mînaka dest pê kê ye..